



COMBINED JOINT TASK FORCE OPERATION INHERENT RESOLVE

Public Affairs Office

March 23, 2020

Release No. 20200323-01

FOR IMMEDIATE RELEASE

Daxuyaniya Fermandarê Leşkerî yê Hevpeymaniyê ji bo yekem salvegera şerê Baxozê

Îro piştî salekê ji şerê dîrokî yê Baxozê ku hebûna fîzîkî ya DAIŞê ji nav bir, em bi rûmet hemû qurbaniyên Hêzên Ewlekariyê yên Iraqî, Hêzên Sûriyeya Demokratîk û hêzên Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê bi bîr tînin. Şerê dawî yê li Newala Navîn a Çemê Firatê xîreta hêzên hevparên me peyitand û nîşan da ku hevpeyman pabend ku derbeya dawî li DAIŞê xîne û beşê dawî yê xaka dawî ya Sûriyeyê ya di destê DAIŞê de rizgar bike. Em rêzê li wan lehengên hevparên me digirin ku di şerê DAIŞê de şehîd ketine û birîndar bûne.

Ji ber van qurbaniyên zêde, hêz û serkeftina Hêzên Ewlekariyê ên Iraqî, Hêzên Sûriyeya Demokratîk û xebatkarên Hevpeymaniyê û wek nîşaneke serkeftina me ya hevbeş, em ghiştine xaleke wiha ku êdî hevparên me şerê li dijî bermahiyên DAIŞê bi awayekî serbixwe bi rê ve dibin û rê li ber DAIŞê digirin ku ji nû ve serî hilde. Di encama vî tiştî de hevpeymanî dê di bi hejmareke kêmtir ji bingehan û li gel hejmareke kêmtir ji mirovan hebûna xwe qayim bike û pabendiya xwe berdewam bike ku piştgiriya bide hevparên xwe ji bo têkçûna DAIŞê mayinde bikin.

Generalê Fermandar Pat White

Generalê Fermandarî

Hêzê Erkê Hevkarî - Pengava Cidîbûna Cewherî